HELBESTA DAWÎ

Selim Biçûk*

Peyvên tirsonek
û
cefîli
werin der û bibêjin
evîna qedaxekirî
her pêlên
deriya helbestan
dilerizin
bifirînin
vekirin
bipijiqînin
perdiya mirinê
hilvînin
û
hozaniya min
ji nû vejînin
Nobedara şevên min
li hêviya helbesta dawî
xwe razandiya
û
hişyar diponije
helbest ji
ji tirsa pênûsê
dilerize
pênûsa ku ji hêstirên
diya min rizî
li şûna lorandinê
şin û girî
dibarîne
tenê hesret û kederan
dizane
û
dihûne
tenê liser evîna
qedaxekirî
distirîne
digirî
û
dilorîne

Nobedara şevên min!
xemrevîna min!
ez ne hozanim
lê dîsa bi min
destanan didî hûnandin
helbestên min
li ber kindirê sêdarê

peyvên min tên bi dar

tên kuştin
û
ku mirin
li ser gora wan
wêneyên xwe binqişîne
daku ji nav xweliya gorê
zîl bidin
û
helbesta dawî
bistirênin.

*Helbestvan û niviskarekî rojava Kurdistane li Elmaniya

Gelên piçûk û ew tiştê dibêjnê "Şerê Şaristaniyan"

Tariq Hemo*

Roj bi roj saloxana "Şerê Şaristaniyan" bilind û bi hêztir dibe, û piştî bûyerên 11. Êlûnê cihanê xwe di nav rewşek nû de dît, ku nîşanên pevçûnên kultûr û şaristaniyan diyar dibin û bi awakî eşkere der di kevin rojevê.

S. Huntington di pirtûka xwe de "The Clash of Civilizations" (ankû: Şerê Şaristaniyan) pêşeroja mirovayetiyê bi şêweyekî gelek xerab û nebaş terxan dike û dibêje, ku hemû şer û cengên di pêşerojê de bi qewmin wê ji encama şereki şaristanî û olî bin. Û li gorî vê nerîna xwe, Huntington mirovatiyê li ser çend grûpên olî û şaristanî dabeş dike.

Berpirsiyar, pispor û şêwirmendên dewletên sereki ji nerîna Huntington bi balkêşî didin ber çavên xwe û mixabin têkilî û siyaseta saziyên xwe li gorî wê yekê pilan dikin û hemû hezên xwe li diji kesên din "dijminên pêşerojê" amade kirine û dikin.

Di qonaxeke weha serûbin û tirsînek de, pirsiyarek giring ji me re tê meydanê: Gelo millet, civak û olên piçûk di karin xwe di vê demê de -heger hat û çû û wisa bû- bi parêzin? Û xwe li pêşiya vê lehiyê û guherînên cihanî bi cih bikin?

Gelên piçûk yên rojhilat weke Kurd û kême diyanetên weke Êzidiyan wê karibin ji encama filosofiya û dîroka xwe ya rojhilatî, civaka xwe ji hêzên "Şerê Şaristaniyan" bi parêzin?

Bi dîtina min, bersiv wê "belê" be. Ji ber Kurdiyatî heger bi çavên Êzidiyatî diniya yê bibîne, wek nimûnek ji "filosofiya rojhilatî aştixwaz", û bi rêka organên xwe û bi hêza media, di kare bi alîkariya dost û hevalên xwe civakeke pêşverû, aştîxwaz û biratîxwaz berû pêşde bide û bi xelkên din naskirin bide. Her wisa filosofiya xwe ya dînî û netewî wek minakek mirovatî ji hemû gelên din re eşkere bike. Û bi vî rengî bibe nimûnek ji wan kesan re, yên di xwazin dergehê dialogê û danûstandina diyanet û şaristaniyan vekin. Û Kurd dikarin bibin ji wan kesên piştevaniya vî dergehê dialogê dikin.

Di vir de, ez bewerim nimûnekî ciwan ew bû, diruşma ku li bin de, Yekemîn Fêstivala Qendîl ji bo Wêjeya Multîkultûrî, hatî li darxistin. Hividarim ku saziyên Kurd bitir xebatê berû wê ditinê bikin.

* Niviskarekî rojavaya Kurdistane, li Elmaniya

Şaristanîya Mirinê

Mehmûdê Ako*

Bajar di mijê de winda dibin.
Deng di bêdengiyê de bela dibe.
Tarî di ruhniyê de şîn dibe,
û çiya di tetehbejê de sohelanê dike
vîn di dilan de hûrhûrî dibe.
Welat di mistek ax de hatiye jibirkirin.
Li şûnwar û hêlînan xar û stirî hatine çandin,
û em bûne bendewarê dengbêjekî.
Mirî bûne cihê payebûn û serbilindiyê.
Şaristanî di kevnayê de di jene.
Şînwar di dîrokê de hatine sêdar kirin,
û azadîyê çavên li şûn xwe rijandin
Leheng şerê sîka xwe dikin.
Partizan henekê xwe bi me dikin.
Nakokiyên li ser biskên keçikê,
cengên li ser mirîşkekê,
û belengaziya min di mirina netewekê de.
Mirov di bênamûsîyê de pîkol bûye.
Koç kirina kernevalên bênirês,
dûmahik ji qûndaxa tivingê re daniye,
û Xwedayê belenguz her bi payîzê de bazdaye.
Lawên te xwezgînyên xwekujiyê ne.
Keçên te xwe firotine dêlktiyê.
Nir ketine stûyan.
Dê bi rojê sed carî zorga dibin.
Masî ji gola derbider dibin,
û li paşerojê dibin bavê sêwî yên me.
Dêlikên şevê dibin xatûnên eywanan.
Gulfiroş dibin navmalyên gavanan.
Stûnên te rahiştine qada bê binî.
Xwînfiroşê te comerdên revê ne.
Goristanên te bê sînorin ,
û sînorên te bi bimbene.
Sîng û berên te di dûmanê de diçirisînin.
Pakrewanên te ji xweziyê di revin.
Û pêşmergên te bûne reşikên şevê.
Buhara qaz û qulingên te,
qîrîna parsekên rojhilatê ye.
Avên zozan û gelyên te,
birînên xwedayê berberîyê ne.

*Helbestvanekî rojava. Kurdistane li Elmaniya diji

Ji bihayên Êzidiyatiyê:

REHIM Û DILOVANÎ

Îdo Babeşêx*

Hemû ol û baweran daxwaz ji mirovan kiriye ta ku li gel hev dilovan û bi rehim bin, dilnerim û helîm bin, ji ber vê yekê navê Xwedê û milyaketan û babçakan bi dilovanî û rehmê ve hatiye girêdan. Ola Êzidî jî rêzeka pir bilind ji rehmê re girtiye û di bêjit, ku Xwedê bi xwe rehme, ya her gav û dem rehim û dilovanî li ser zimanê mirovê Êzidiye.

Têkistên ola Êzidî pirin ji rehim û dilovaniyê, lê em çend nimûne ji xwendevanên delal re pêşkêş dikin:

Di baweriya Êzidiyan de mirovê dilê wî ji rehima Xwedê vala bit ew qet beheştê nabîne, wek di vê sebeqê ji qewlê(*Mîştaqê sê borim)* de hatiye:

Liba `erîfa we dibêne
Hincî dilê rehma Xwedê têne
Ew ne ji xelkê biheştê ne (1)

Mirovê dilê wî bê rehim û dilovanî bit, anku dilê wî req û dijwar bit ew dê li dunya din li nav mar û dûpişkan de mîne û Xwedê jê razî nabe, weku ev sebeq ji qewlê berê diyar dike:

Liba `erîfa we diyare
Hincî dilê bi xezebe û bi jehre
Ewî mala xwe avakiriya ji bo dûpişk û mara. (2)

Yanî Êzidiyatî ji mirovê Êzidî di xwaze, her û her î dilrehim û helîmbit, dilê wî pir bi rehim bit û bersiva xirabiyê bi karê xirab nebit. Mirov pêdivye dilfereh û dilovan bit, li şaşiyên hevalên xwe negirt ta ew bixwe li xwe bizîvirt û şaşiyên xwe rast bikit, daxwaz û lêborînê ji mirovî bike, wisa hem mirov kêm nabit û hem girhê zû têne vekirin, weku di van sebeqan ji qewlê(*Şîrê rastiyê) de* xweya dibe:

Wekî te dilê xwe xankir
Mala xwe mîrûstankir
Gelek nexweşîn têde dermankir
...
Wekî te dilê xwe kir xane
Mala xwe kir mîrûstane
Gelek nexweşî tê de kir dermane (3)

Pêdivye ku mirovê Êzidî dilpakbit, dûrbit ji xedir û dil reşiyê çinku xedir û dilreşî gunehekî girane li ola Êzidiyan de mîna qewlê (*Hesedî Altewrî*) ji mere rêz dike:

Hun buxtaniyê mekin biran
Dilê xwe safî bikin ji xediran
Zor ji vê dunyayê çûn bi gunehêd giran (4)

Bi vî awayî ji mere xweya dibe ku rehim û dilovanî û lêborîn û dilpakî pir girigin di Êzidiyatiyê de û ez bawerim ku roji bi xwe ji bo hindê ne da mirov bîr li mirovtiyê û dilovniyê bike, û hemû kerb û kinê ji dilê xwe bavîje.

1-2 Qewlê *Mîştaqê sê borim*, belavkirina Şêx Elo Xelef. Govara Laliş (j. 11) Tebax 1999-Dihok
3 Êzidiyatî li ber ronaya hindek têkistêd ayînê Êzidiyan (l. 72) Xidirê Silêman û Xelilê Cindî. Korî Zaniyarî Kurd- Bexda 1979
4 Êzidiyatî....., (l. 7)

* *Niviskar û maşnas, li Elmaniya*

QENDÎL
www.qendil.de
Rojnameke.Çandî.Edebî.Gîştî.Serbixwe
Li 2 Sibatê 2001 hatiye damezrandin

Weşandin: **Komîta Ciwanan ya EZiA**
Serniviser: **Mirza H. Dinnayi**
Rêdaksiyon:
Fewzî Çelîk **Hussein Nermo**
Şivan Şêx Elo **Serhan Isa**
Çapkirin û belavkirin: **Qendil Verlag**
Grafîk: **E. Şingalî**

Copyright © Qendil 2001

ISSN 1617-5174

Navnîşan: Qendil
Postfach 150 265
07714 Jena/ Germany
Fax: 03641 238728
Email: webmaster@qendil.de

Beşê Kurdî: PF 219118, 33604 Bielefeld

Abona Salane: 21 Euro -li gel postekirin-

Bankverbindung:
Empfänger: Zeitungsverlag
Kontonummer: 649 063 104
BLZ: 100 100 10
bei: Postbank Berlin